



DİYARBAKIR SİYASAL VE SOSYAL
ARAŞTIRMALAR ENSTİTÜSÜ

ENSTİTUYA DİYARBEKİRÊ BO
LÊKOLÎNÊN SIYASÎ Û CIVAKÎ

DİYARBAKIR INSTITUTE FOR POLITICAL
AND SOCIAL RESEARCH

PLANSAZÎ Û POLÎTİKAYÊN DEWLETAN: PIRZIMANÎTÎ DI PERWERDEHIYÊ DE

4

RÊZEBELAVOKÊNBERÎ HER TIŞTÊ ZIMANÊ DAYIKÊ



Kurt İsmail Paşa
2. Sokak
Güneş Plaza No:18
21100 Yenişehir
Diyarbakır
Türkiye
T: +90 412 228 14 42
F: +90 412 224 14 42
www.disa.org.tr
info@disa.org.tr



**DİYARBAKIR SİYASAL VE SOSYAL
ARAŞTIRMALAR ENSTİTÜSÜ**

**ENSTİTÜYA DİYARBEKİRÊ BO
LÊKOLİNÊN SİYASÎ Û CIVAKÎ**

**DİYARBAKIR INSTITUTE FOR POLITICAL
AND SOCIAL RESEARCH**

**BERÎ HER TIŞTÎ ZIMANÊ DAYİKÊ
WEŞANÊN DÎSAyê**

ISBN: 978-605-5458-06-5

Belavoka Berî Her Tiştê Zimanê Dayikê çerçeyeke projeya salane ya Bilindkirina Hişmendiyê derheqê Zimanê Dayikê û Duzimani di Perwerdeyê de ye ku ji şeş hejmaran pêk tê. Di van belavokan de derheqê mijarên wek têkiliya perwerdehî û zimanê dayikê, cihê perwerdeya ser esasa zimanê dayikê di xelaskirina newekheviyan de, cihê zimanê dayikê di jiyana civakî, kulturî û siyasî de agahiyên kêrhatî pêşkêşî gel bike. Hûn dikarin belavoka dumehî li ser malpera www.disa.org.tr peyda bikin.

Nivîsarên di vê belavoka me ya çarem de çih digirin bi destê Mine Derinceyê ji çend çavkaniyên cuda ên akademîk hatine berhevkerin û amadekirin. Keda Beril Eyüboğlu gelek hêja ye disererastkirina Tirkî de. Wergera kurmancî bi destê Osman Mehmed hatiye kirin. Ji aliyê rupelsazî û bergsaziyê de ji em gelek spas dikin Emre Senan. Em gelek spas dikin Veysel Akdeniz bo fotograen wî.

Ji kerema xwe herin रुपela www.disa.org.tr/onceanadili4.pdf an ji me agahdar bikin ji bo ku belavoka me bi dest bixin.

Çap: Ege Basım Matbaa ve Reklam Sanatları

Copyright © Gulan 2012

Belavoka **Berî Her Tiştê Zimanê Dayikê** wek gavekê projeya Enstitüya Diyarbekirê bo Lêkolînê Siyasî û Civakî (DİSA) ya bi navê Bilindkirina Hişmendiyê derheqê Zimanê Dayikê û Duzimani di Perwerdeyê de ku piştgiyariya fona Matra'yê ya Balyozxaneya Holandê wergirtiye di bin berpirsîyariya Şerif Derince de hatiye amadekirin. Dibe ku fikr û dîtinên di belavokê de çih digirin yek bi yek bi yê DİSA û Balyozxaneya Holandê ji hev negirin. Ti astengî û rêgirtin tune li ber zêdekirin û belavkirina belavokê de tenê heke çavkanî bête destnîşankirin bi awayeke ron û zelal.

Bi arîkariya



Kingdom of the Netherlands

**PLANSAZÎ Û POLÎTÎKAYÊN
DEWLETAN: PIRZIMANÎTÎ DI
PERWERDEHIYÊ DE**



Plansaziya Zimên û Pirr-zimanî di Perwerdehiyê de

Gava em behsa plansaziya zimên dikin em ne tenê behsa hindêk biryarên fermî, pêşniyarên konferansên navneteweyî, amarên (statîstîkên) ezmûnê an jî encamên projene zimên dikin; di heman demê de têkoşîneke desthilatê ya cidî jî dibe mijara behsa me. Ji lewma, fêrkariya zimanekî an jî perwerdehiya bi zimanekî, bi kîjan awayî be bila be, bêyî ku hesabên desthilatê û feraseta rêveberiyê bê birbîrxistin têra xwe wê neyê fêmkirin. Ji ber vê, bi qasî kîjan ziman bi çi awayî di dibistanan de cih digrin, kîjan ziman çawa tîr hermonîkîrîn jî bi hesabên desthilatê yêr têra xwe cidî, tîr diyarkirin. Nêrîna li pênasayên cuda yêr derbarê plansaziya zimên de, dibe ku bihêle em vê mijarê baştir fêm bikin.

Li gorî pênasayekê, plansaziya zimên ew destkariyên eşkere û sistematîk in ku bi destê meqamên fermî tê kirin ji bo çareserkirina kêşeyên derbarê zimanan an jî bikaranîna cudahiyan nav-zimanî de.¹ Li gorî pênasayekê din, plansaziya zimên ew hewldan e ku bi awayekî eşkere tesîrê li tevger û helwestên kes an jî koman dike derbarê fêrbûn an fêrnebûna wan a zimanekî an jî zimanên bêhtir de.² Komek akademîsyenên din jî plansaziya zimên wek beyanekê (retorîkekê) pênasê dikin ku derbarê ziman û civakê de hatî hilberandin û di nava xwe de rêwêjên cûrbicûr ên îdeolojîk di hewîne.³

Wekû ji van hemû pênasayên jî hev cuda jî bi rehetî bê fêmkirin, plansaziya zimên, her kélî li ber destkariyên desthilat û siyasê ye. Bi ser de, ji ber ku hemû welatên cîhanê li ser wan erdan e ku ji yek zimanî bêhtir zimanan di nava xwe de di hewîne, plansaziya zimên yek ji rojevên giring ên eşkere an jî veşarî yêr her welatî ye. Lê belê di pergalên siyasî yêr jî hev cuda de ev mijar bi awayên cuda tê axaftin. Li gorî Ruizê⁴ ku li ser van mijaran xebat kirine, derbarê plansaziya zimên de sê nêzîktêdayînên bingehîn hene: Yêr ku wek kêşeyekê nêzîkahiyê li zimên dikin, yêr wek maf nêzîkahiyê lê dikin an jî yêr wek serekaniyê (çavkaniyê) nêzîkahiyê lê dikin.

Nêzîktêdayîna yekem, bêhtir di qonaxên damezirandina netew-dewletê de xuya dike û armanca wê ew e ku welatekî diyar bi awayê zimanî bê homojenkirin. Li van welatan bi taybetî kirpa “yek”ê derdikeve pêş. Zimane-civaknas (zanyarê zimanê civakê – sosyolinguîst) Bamgbose⁵, di qonaxa damezrandina gelek welatên bi awayê netew-dewletê de yêr li Efrîqayê ku ji aliyê cudahiyan zimanî ve dewlemendtirîn parzemîna cîhanê ye, derbarê kirpeke “yekbûn”ê ya bi vî rengî de tesbîtên giring dike:

Li Efrîqayê, me têgeha “yek”ê bi têra xwe xistiye dirûvê wasewasê. Li gorî vê yekê, rêvebirina welatan a li ser “yek-ziman”î bi tena serê xwe ne bes e, di heman demê de divê pergala “yek-partî”

jî bê pejirandin. Li gorî vê baweriya xelet, li van welatên pîrr-etnîk, pîrr-ziman û pîrr-kultur, bi saya yek-zimanî û yek-partiyê, dihevgerîna sosyokultûrî, yekîti û tevahiya siyasî, dikare pêk were.

Wek nimûneya li jor, li Tirkîyeyê jî ji damezirandina Komarê û vir ve kirpa “yekbûn”ê ji gellek aliyan ve zêde zêde derketiye pêş, û ev xistine dirûvê wasewasekê. Çawa ku di dam û dezgehên gelemperî de û li ser gellek çiya û zinarên erdnîgariya Kurdistanê dirûşmên “yek ziman, yek al, yek welat” hatine nivîsandin, politikayên dewletê her ku ji wan hatiye bal kişandiyê ser “yek-ziman”î. Li deverên ku ev politîka lê tîn meşandin, baweriyeke wiha serdest e ku ger zimanên ji bilî zimanê serdest bîn bikaranîn wê ev yek bibe asteng li ber tevabûn û lihevguncinê; û berevajî wê dijminatî û pevçûnan bi xwe re bîne. Ji lewma, nişan ji jiholêrakirina zimanên cuda tê girtin da ku “kêşe”yê dernexin. Lê belê bi sedan nimûneyên ji cîhanê şer û pevçûnên dawî yê sedsalane li Tirkîyeyê, nişan dide ku ev bawerî têra xwe bêbingeh e, berevajî vê, politîka û plansaziyezîmên ên bi vî rengî bi xwe zemînê li pevçûnê xweş dikin.

Di nêzîktêdayîna duwem de jî, welat zimanan qedexe nakin, berevajî vê, wan bi qanûnan dixin ber ewlehiyê. Li welatên ku plansaziyezîmên ên bi vî rengî heyî, komên xwedî zimanên zikmakî yê jihevçuda, xwedî maf in ku bi zimanê xwe yê zikmakî perwerdehiyê wergirin, li dam û dezgehên gelemperî û li qadên cûrbicûr ên gelemperî zimanê xwe bi kar bînin. Lê belê ji ber ku ev mafên navborî hatine pejirandin li van welatan, her tîm nayê wê ma’neyê ku gel ji van mafan bi awayekî wekhevî sûdê werdigrin. Bo nimûne destûra bîngêhîna Hindîstanê, hemû zimanên ku li Hindîstanê tîn bikaranîn bi qanûnan dipejirîne û han dide ku bi van zimanan perwerdehî xizmetguzariyên gelemperî bîn pêşkêşkin. Lê belê di rastiyê de, bi tenê zimanên ku bi awayekî îzafî hêza wan a aborî, demografîk û siyasî bêhtir e ji van qanûnan sûdê werdigrin, û hê gellek zimanên din jî li ber çavan xuya nakin.

Plansaziyezîmên a cûreyê sêyem jî, li wan welatan derdikeve pêşberî me ku ziman tenê bi xistina ber ewlehiya qanûnî namînin, di heman demê de bi awayekî fe’al (çalak) li qad û warên û cûrbicûr piştgiyariya wan tê kirin û bikaranîna wan tê handan. Bo nimûne Etiyopya, Papûa Gîneya Nû, Finland, Bolîvya, Herêma Federe a Kurdistanê, Welatê Baskê ew welat an jî herêm in ku politikayên zîmên ên bi vî rengî lê tîn meşandin. Li van herêm û welatan, hemû komên zimanî hem xwedî maf in ku bi zimanê xwe yê zikmakî perwerdehiyê wergirin, hem jî ji bo ku ji van mafan sûdê wergirin hikûmetên deverên navborî, tevdîrên xwe yê hewce digrin. Bo nimûne; li Herêma Federe a Kurdistanê ji bilî Kurdan ku zorîneyê (pîrrane) pêk tînin, Tirkmen, Erebb û Asûrî-Keldanî jî bi zimanê xwe yê zikmakî perwerdehiyê werdigrin, qenalên televizyon û radyoyê vedikin û ji bo vê jî sûdê ji budçeya hikûmetê werdigrin.

Li gellek welatên cîhanê mînakên van her sê nêzîktêdayînan hene. Lê belê ev nêzîktêdayînan li welatên navborî ku carekê dest pê kirin her car bi heman awayî berdeham nekîrine. Lewra gellek welatên ku derbarê plansaziya zîmên de nêzîktêdayîneke diyar nişan dayî, piştî têkoşîn, veguherîn û guherînên cûrbicûr naçar mane ku nêzîktêdayînen nû li kirasê politikayên xwe yê zîmên bikin. Bo nimûne, gellek ji welatên Efrîqayê yê li jor hatî behskirin, nêzîktêdayîna yek-zimanî ya ku dimeşandin bi wext re dev jê berdane, li şûna wê nêzîktêdayînen plansaziyezîmên duwem an jî sêyem pejirandine. Mînakên berevajî guherînên bi vî rengî jî pêk hatine. Bo nimûne, de dema Yekîtiya Sowyetan de, di qonaxên pêşî yê şoreşa Bolşevîk de û salên piştî ku şoreşa



Kulturî ya Çînê hatî kirin,⁶ hatiye handan ku her cûre zimanên li van welatan li herêmên ku lê ne di pêwendiyên fermî û rojane de bi awayekî fe'al bê bikaranîn, li zanîngehan kursiyên zimên hatine damezirandin û ji bo zimanên ku zimanê wan î nivîskî nehatiye danîn akademî hatine damezirandin da ku ev ziman di perwerdehiyê de bê bikaranîn. Li vir armanc ew bawerî bûye ku bi handana zorîneya (pirrane) li erdnîgariya pîrr-zimanî û pîrr-kulturî re gihîştina tevahiya siyasî û îdealên komunist bû. Lê belê bi pêşveçûnên piştre re, hem di qonaxên dawî yên rejîmên komunist de hem jî di dema hewldanên terkandîna van rejîman û entegrebûna pergala kapîtalîst de, dev ji polîtîkayên zimên ên pîrralî hatiye berdan ku berê dihatin sepandin û li şûna wan dest bi pejirandina polîtîkayên zordest hatiye kirin.

Wek tê dîtîn, plansaziya zimên mijareke têra xwe girîng e ku ji nêz ve tesîrê li jiyana rojane ya mirovan dike û li welatên cuda cuda gellek sepandinên wê yên cûrbicûr hene. Ji ber vê, di vê belavokê de, di konteksên cuda yên welatan de derbarê plansaziyê zimên û bikaranîna pîrr-zimanîtiyê di perwerdehiyê de, li gellek mînakên ji nêz ve tê nêrîn. Welatên ku di vê broşûrê de bûne mijar, bêhtir wek nimûne hatine dayîn bo wan nêzîktêdayînen plansaziya zimên ên cûreyê duwem û sêyem ku li jor hatî behskirin. Hêvî ew e ku li Tirkiyeyê êdî nêzîktêdayînen bi vî rengî bê meşandin û dev ji wan polîtîkayên zimên ên zordest û yekperist bê berdan ku dîroka komarê pê de her berdeyam bûne.

Di nivîsa me ya pêşî ya belavokê de, nimûneya Belçîkayê hatiye dayîn ku bi awayekî fermî duzimanîti û di perwerdehiyê de jî pîrr-zimanîti lê hatiye qebûl kirin. Nivîs, balê dikşîne ser wan guherînen tevger û nêzîktêdayînen derbarê pîrr-zimanîtiyê de ku taybet e bi Belçîkayê û rê li ber nîqaşkirina polîtîkayên pîrr-zimanîtiya civakî vedike. Mijara nivîsa me ya duwem jî polîtîkayên zimên û perwerdehiya pîrr-zimanî li Îsraîlê ye. Di vê nivîsê de tê destnîşankirin ku Îsraîl polîtîkayê zimên a navendî û yekperist namesîne û di serî de Erebi di perwerdehiya komên niştecih û koçber ên li welêt dijîn de zimanê wan î zikmakî wek zimanê perwerdehiyê tê bikaranîn an jî ev ziman wek ders tên fêrkirin. Nivîseke din derbarê rewşa civake-zimanî ya Sâmiyên li her sê welatên Skandinâv de ye ku di nav sînoren Norwêç, Swêd, Finland û Rûsya de dimînin. Di vê nivîsê de tê dîtîn ku ev welatên navborî bi awayekî dîrokî û îro li ser mijara zimanên Sâmi polîtîkayên cuda dimeşînin, lê belê dîsa jî li gorî gellek komên kêmine yên zimanî Sâmi sûdê ji derfetên girîng ên zimanî û perwerdehî wêrdigrin. Nivîsa dawî ya di broşûrê de jî, cih daye plansaziyên zimên ên li welatên cûrbicûr ên Ewropaya Rojhilat, Transkafkasya û Asyaya Navîn ku piştî belavbûna Sowyetan hatine damezirandin. Nivîs nîşan dide ku li welatên cuda polîtîkayên cihê tên meşandin, wek meyleke giştî jî zimanên fermî yên welatan û zimanên bihêz ên herêmî di jiyana rojane de û di qadên gelemperî de bi awayekî fe'al tên bikaranîn, lê belê komên ku bi zimanên kêmnîyê yên prestîja wan kêmtir diaxivin jî tûşî kêşeyên cidî dibin.

Şerif Derince

Enstîtuya Diyarbekirê bo Lêkolînen Siyasî û Ciuahî.

1 Christian, D. (1988). *Language planning: the view from linguistics*. Di nav de Newmeyer, F. (Ed.), *The Cambridge Survey IV: Language: The Socio-Cultural Context*. 193–209.

2 Cooper, R.L. (1989). *Language Planning and social change*. Cambridge: Cambridge University Press.

3 Blommaert, J. (1996) *Language Planning as a Discourse on Language and Society: The Linguistic Ideology of a Scholarly Tradition*. *Language Problems and Language Planning*, 20/3: 199–222.

4 Ruiz, R. (1984). *Orientations in Language Planning*. Di nav de Baker, C. (1993). *Foundations of Bilingual Education and Bilingualism* (1. Baskî). Clevedon: Multilingual Matters.

5 Bamgbose, A. (1994). *Pride and Prejudice in multilingualism*. Di nav de Fardon, R. & Furniss, G. (Ed.). *African Languages, Development and the State* (s. 33–43) Londra: Routledge.

6 Li ser vê mijarê bo agahiyeke berfirehtir dikare li beşa pêwendîdar a xebata me ya bi navê Kula Zimanê bê nêrîn. Binêrîn, Coşkun, V., Derince, Ş. û Uçarlar, N. (2010). *Kula Ziman: Kêşeya Bikarnameyê Zimanê Zikmakî di Perwerdeyê de li Tirkiyeyê û Serhatiyên Xwendekarên Kurd*. Enstîtuya Diyarbekirê bo Lêkolînen Siyasî û Ciuahî.

Perwerdehiya Zimên Li Belçîkayê

Belçîka, li gorî destûra xwe ya bingehîn welatekî sê zimaniyê. Zimanên ku di destûra bingehîn de hatine diyarkirin Flamanî, Frensî û Elmanî ne. Bi gotineke din, ev welat ji bilî koçberan ji sê gelan pêk tê ku bi Flamanî, Frensî û Elmanî diaxivin. Belçîka, bi awayekî erdnîgarî ji sê herêman pêk tê ku ev jî Valonya, Flamanca û Paytext (Brûksel) in. Li Valonyayê bi pirranî Frensî, li Flamanca jî bêhtir Flamanî tê axaftin. Li van herêman, sînorên erdnîgarî li gorî cihên ku ziman lê tê axaftin hatine diyarkirin, yanî Frensî û Flamanî tekane zimanên fermî ne li van herêman. Lê belê li herêma Paytext hem Flamanî hem jî Frensî bi awayekî berbelav tê axaftin. Ev herêm hem xwedî pîrr-zimaniya civakî hem jî xwedî pîrr-zimaniya kesane ye. Pîrr-zimaniya civakî wiha tê pênasekirin ku di nav civakê de du an jî zêdetir ziman wek fermî bînin pejirandin û ji aliyê civakê ve bi awayekî berbelav du an jî zêdetir ziman bînin bikaranîn. Li beramberî vê pîrr-zimaniya kesane wan rewsan eşkere dike ku kes xwedî pîrr-ziman in lê belê herêm bi awayekî fermî yek-ziman tê pejirandin. Li Belçîkayê, wek li gellek herêmên Ewropayê, hem jî aliyê pîrr-zimaniya civakî ve hem jî ji aliyê pîrr-zimaniya kesane ve zêdebûnekê tê çavdêrîkirin. Nivîsa li jêr behsa pîrr-zimaniyê dike di mînaka Belçîkayê de.

Qonaxên Dîrokî ya Pîrr-zimaniyê Li Belçîkayê

Li herêma Flamanê pîrr-zimani, ji Serdema Navîn pê de bûye rewşeke berbelav. Lê belê di sedsala 17. de ji dewra Louisê 14. pê de Frensî dest bi berbelavbûnê kiriye, di sedsalên 19. û 20. de jîdestçûnên zimanan pêk hatine û êdî li herêmê Frensî bûye tekane zimanê serdest. Ev qonaxa ku mirov dikare wê bi Frensewîkirinê bi nav bike, li dawîya salên 1960î rawestayê, vê demê qanûnên cûrbicûr hatine derxistin û li şûna pîrr-zimaniya civakî piştçûnê pîrr-zimaniya kesane hatiye kirin.

Lê li Valonyayê qonaxa dîroka zimani têra xwe cuda ye. Lewra Valonî, ji dûr ve li guherînên li Frensayê nihêriye, û van guherînan pîrr tesîr lê nekiriye. Her wiha digel ku gellek zaravayên li Frensayê piştî Şoreşa Frensî wînda bûne û cihê xwe ji Frensiyê standardîzekirî re hiştine, Valonî demeke dirêj neketiye nav qonaxên standardbûnê û li bikaranîna xwe ya devokên cuda yê nêv-zimani berdeham bûye.

Pîrr-zimaniya Civakî û Pîrr-zimaniya Kesane

Di gellek mînakên welatan de bandora giring a livbaziya civakî û veguherînên siyasî li ser wê yekê çêbûye ku pîrr-zimaniya civakî cihê xwe ji pîrr-zimaniya kesane re bihêle. Ber bi dawîya sedsala 19. li Brûkselê zarokên ku zimanê wan î zikmakî Flamanî ye bi hincetên ku wê perwerdehiya duzimanî wergirin hatiye hiştin ku perwerdehiya bi giranî li ser Frensî wergirin û li herêmên ku berê Flamanî lê dihat axaftin êdî hêdî hêdî Frensî dest bi berbelavbûnê kiriye. Lê belê li dijî kêmbûna bikaranîna zimanê Flamanî li herêma Flamanê û Brûkselê, Teverga Siyasî ya Flaman, di sedsalên 19. û 20. de muxalefeteke cidî bi rêk xistiye, destnîşan kiriye ku pîrr-zimaniya kesane û



Frensewikirin her yek in û ev rewş li ser Flamanî gefekê pêk tîne. Ji ber vê yekê polîtîkayên zimên ên li herêma Flamanê, bi derxistina gellek qanûnên zimên re di salên 1960î de, bûye sedem ku guherîna îro jî berdeham dikin pêk bên di helwest û hişê gel de li ser mijara pîrr-zimaniyê, û ber lê hatiye girtin ku Frensî li herêma Flamanê bibe zimanê fermî. Lê belê vê rewşê rê li ber wê yekê vekirîye ku cûreyekî pîrr-zimaniya kesane derkeve holê.

Ji aliyekî din ve hin pêşveçûnên di heman demê de xwe dane der jî hiştiye ku li Belçîkayê pîrr-zimaniya kesane berbelav bibe. Di bingeha vê guherîna ku dawîya sedsala zoan derketiye holê de du sedem cih digrin. Ya pêşî ew e ku zarokên malbatên karkerên ku koçî bajaran kirine, dest bi dibistanê kiriye. Ji sala 1982yan pê de li ser bernameyên perwerdehiya cot-ziman ên bi navê Foyer hatiye rawestan, û van bernameyan hiştiye ku pîrr-zimaniya kesane di salên 1990î de pîrr populer bibe. Sedema duwem jî yekbûna Ewropayê ye, yanî damezrîna Yekîtiya Ewropayê ye. Vê rewşê berê fêrbûn û fêrkariya zimên daye aliyekî din. Polîtîkayên zimên ên Ewropayê, bi handana fêrbûna bi kêmanî du zimanên biyanî ji bilî zimanê zikmakî, pîrr-zimaniya kesane derxistiye pêş.

Plansaziya Zimên

Polîtîkayên zimên ên li Belçîkayê, demeke dirêj hînî pêşveçûna bilez a pîrr-zimaniya kesane nebûye. Lewra li herêmên Flamanyayê û Valonyayê yên li derveyî herêma Paytextê, qanûnan demeke dirêj destûr nedaye ku dibistanên duzimanî ên Flamanî/Frensî bên vekirin. Lê belê ji sala 1998an pê de hikûmeta Valon biryarnameyek derxistiye, û bi hin şert û mercan qebûl kiriye ku li herêma xwe di asta dibistana seretayî de dersên zimanê Flamanî bên fêrkirin. Piştî ku ji vê demê û pê de li Valonyayê dersên Flamanî di dibistanan de hatine dayîn, li beramber vê bertekên erênî hatin nîşandan, û niha li dora 20 dibistanan polê zimanê Flamanî vekirîye. Her wiha di van dibistanan de bi rêjeyên ku ji %20î heta bi ji %80yî yê bernameya hindekariyê tê guhertin, sepandinên derbarê fêrbûna zimanê duwem de tên meşandin. Ji bilî vê li Brükselê, yanî li herêma Paytextê, li dibistanên Foyer¹ bi zimanên wek Spanî, Îtalyanî û Tirkî jî perwerdehiya duzimanî tê kirin. Digel ku bi awayekî fermî ev bername ji bo Belçîkiyan nelê be jî, hindek dê û bavên Belçîkî ku ne bi koçberî hatine jî ji van bernameyan sûdê wêrdigirin. Lê li herêma Flamanê bernameyên bi vî rengî hîn tune ne.

Rêbazên Hindekariya Zimên a Pîrr-ziman

Eleqeya li ser pîrr-zimaniyê û pê re pê re perwerdehiya pîrr-ziman, yanî bernameyên perwerdehiyê yên ku hemû xwendekar bi kêmanî du an bêhtir zimanan fêr dibin, bûye bingeh ji nîqaşên derbarê rêbazên pîrr-zimanî de. Li herêma Valonê digel ku rêbaza pîrr-zimankirinê (immersion) tê tercîhkirin ku di pergala perwerdehiyê ya Kanadayê de tê bikaranîn, wek ku li gellek welatên Ewropayê wiha ye, li gellek herêmên Belçîkayê ew rêbaza bi navê CLIL² tê sepandin ku mijarên bernameya hindekariyê bi riya zimanê ku tê xwestin bê fêrkirin, tê fêrkirin. Rêbaza CLILê, li gor bernameyên pîrr-zimankirinê bêhtir hatiye tercîhkirin, ev jî ber wê ye ku bernameyêke nermtir e. Bernameyên CLILê, li pênc xalên cuda hûr bûye, û ligel zimanê armanc faktorên derbarê dorhêlî, kulturî, naverok û fêrbûnê de jî li qelem xistiye û nêzîktêdayîneke hevgrîtîr anîye bo fêrbûna zimên.

¹ Foyer, yekem car li Brukselê hatiye avakirin bi mebesta jinûve serûberkirina pêwendiyên nav-etnîkî bi saya feresetekî pîrrzimanî û pîrrçandîti, û sazî li dû berjevendiyan diravî nîne. Bi piştigîrî û handana vê sazîyê li Brukselê dibistanên duzimanî hatine vekirin ku xwendekar bikarin hem Fransîzî hem jî Flamanî fêr bibin.

² Metoda CLIL (Content and Language Integrated Learning), li ser wê bingehê tê birêxistin ku hinek dersên mîfredatê ne bi zimanê dayikê yê xwendekarên lê bi zimanekî biyanî bên dayîn. Ev metot wextekî di dibistanên bi navê Anadolu Lisesi dihatê bikaranîn li Tirkiyê. Ev metot anîha li gelek welatên Ewropayê tê şopandin û hatiye dîtin ku encamên gelek serheftî jê derketine heta anîha.



Polîtîkayên Zimên û Perwerdehiya Pîrr-zimanî li Îsraîlê

Li gorî Lambertê civakzimanas, polîtîkayên zimên ên dewletan li sê koman dabeş dibin: kategoriya homojen, kategoriya dualî û kategoriya mozaîk. Di kategoriya homojen de digel ku koma ku pîrraneya li herêmekê an welatekî pêk tîne bi zimanekî diaxive, koma an jî komên kêmîne dibe ku yek zimanî an jî çend zimanan bi kar binin. Gellek welatên li Ewropaya Rojava, Emrîka, Rûsya û Japonya dikare wek nimûne bên dayîn. Lê di kategoriya dualî de welat li du an jî sê herêmên zimanî an komên zimanî dabeş bûye; wek Kanada, Belçîka, Iraq û Sîngapûrê. Li welatên mozaîk jî ew kategorî kara ye ku bi giştî pênc an jî zêdetir komên zimanî pîrraneyê pêk tînin. Bo nimûne jî Nijerya, Etiyopya, Papua Gîneya Nû û Hindistan dikare bê dayîn. Îsraîl, di vê tesnîfkirina polîtîkayên zimên de wek nimûneyekê derdikeve pêşberî me ku dikare têkeve nav van kategoriyên navborî tevan. Îsraîl di nav kategoriya homojen de cih digre lewra qada bikaranîna zimanê Îbranî hegemonîk e û digel ku di hemû dam û dezgehên fermî de pêwîst e bê bikaranîn, di nav jiyana civakî de jî zimanekî serdest e. Îsraîl di heman demê de di kategoriya dualî de jî dikare wek nimûne bê dayîn, lewra du zimanên fermî yên welêt hene: Îbranîkî û Erebî. Her wiha Îsraîl welatek e ku gellek koçberên ji welatên cuda cuda dihewîne û komên serjimêrê yên cûrbicûr lê dijîn û ev yek jî dihêle ku Îsraîl polîtîkayên zimên ên kategoriya mozaîk jî li xwe bigre.

Îbranîkî zimanê serdest e ku di qada fermî, gelemperî û taybet de 5-6 milyon mirov pê diaxivin. Digel ku polîtîkayên zimên ên fermî bi awayekî nixumandî piştgiyaya hegemonyaya Îbranîkî bi gotineke din piştgiyaya yek-zimaniyê dike, ji aliyekî ve jî pêdiviya serjimêra ku bi Erebî diaxive bi duzimanîya Îbranîkî/Erebî çêbûye. Meyla vê duzimanîya Îbranîkî/Erebî bêhtir li ser Îbranîkî ye, lê belê zimanê Erebî jî wek zimanê civakî, perwerdehî, nivîskî û kulturî bi awayekî berbelav tê bikaranîn. Îbranîkî di qada karûbar de (ji bilî herêma Filistinê) û di karûbarên îdarî de bûye navgîna ragihandinê. Qanûn bi Îbranîkî ne, dadgeh bi Îbranîkî tên temsîlkirin, di dozan de gava pêdivî pê bû wergêr hene. Zimanê serdest ê perwerdehiyê jî di sa Îbranîkî ye, lê belê li herêma Filistinê zimanê perwerdehiyê Erebî ye.

Ger em bi awayekî dîrokî lê binêrin, emê bibînin li herêma ku îro wek dewleta Îsraîlê tê zanîn, demeke dirêj polîtîkayêke zimên a navendî ne di fe'aliyetê de bûye. Berê ji bo komên cuda bernamêyên zimên ên cihê dihatin pêkanîn û tevahiya welêt û pêdiviyên welatîyan li ber çavan nedihate girtin. Bi awayekî din, polîtîkayên zimên çawalêhato dihatin pêkanîn. Di dewra hukmê (mandata) Ingilîzan de civatên Ereb û Cihûyan tûşî polîtîkayên zimên ên cihê dibûn, û van koman di nav xwe de awayên perwerdehiyê yên cûrbicûr wek taybet-gelemperî û dînî-laîk hilberandiye. Tenê, ji demên dawî yên rêveberiya mandatê pê de bi bihêzbûna



tevgera Siyonîst re hewl hatiye dayîn ku di bin kontrola dewletê de plansaziyeke zimên a navendî bê kirin. Van xebatan rê li ber qeyranên siyasî yên cidî vekirîye, dawiyê jî bûye sedem ku sala 1953an Qanûna Perwerdehiyê derkeve ku hê jî tê şopandin. Vê qanûnê her çend belênd daye ku bi awayekî bingehîn nêzîktêdayîneke wekhevîparêz û gerdûnî pêşan bide jî nikariye dabeşbûnê berê ji holê rake, îro jî perwerdehî hîn bi awayekî bingehîn li du kategoriyan gîştî hatiye dabeşkirin ku yek jê devera Cihûyan e ya din jî devera Ereban e. Her wiha di nava van deveran bi xwe de, bernamêyên xwe yên perwerdehiyê yên dîni û laîk û herêmên xwe yên xweser ên Durzî û Kibutzî jî hene. Lê mirov nikare bibêje ku di navbera van koman de têkiliyeke wekhevîparêz heye. Ji gava ku dewleta Îsraîlê hatiye damezrandin, bijarteyên Siyonîst, îdîa kiriye ku divê Îbranîkî bibe zimanê xwezayî yê welêt, lewra ev, zimanê bingehîn ê baweriya Mûsewîtiyê ye. Ji ber vê yekê, çî zimanê Erebi çî jî zimanên Ladîno ku Cihûyên Rojhilata Navînî yên ji welatên cuda yên Ereban koçî Îsraîlê kirine, pê diaxivin, demên dirêj pê de hatiye hewldan ku bêna biçûkxistin. Lê belê hem di daxuyannamêya damezrînê ya dewleta Îsraîlê de hem jî li gorî qanûna Îngilîzan a rêveberiya herêmî ya Filistinê, biryar hatiye girtin ku hemû karûbarên fermî yên dewletê wê bi Îbranîkî, Erebi û Îngilîzî bin. Her çend divêtiyên van peymanan bi tevahî nehatibin bicihanîn jî li herêma Filistinê perwerdehiya li ser bingehê Erebi hatiye dayîn, Îbranîkî û Îngilîzî jî wek zimanên duwem û sêyem di dibistanan de li bernamêyên perwerdehiyê hatine zêdekirin. Lê belê li Îsraîlê perwerdehiya zanîngehê tenê bi zimanê Îbranî tê kirin, ji loma bidestxistina xwende-nivîsendetiya Îbranîkî û bi vî zimanî xwedî qabiliyetên bilind ên zimên bûyîn, ji bo hemû Filistinîyên ku bixwazin perwerdehiya zanîngehê wergirin bûye mecbûrî.

Ji aliyekî din ve di demên dawî de, bi taybetî piştî belavbûna Bloka Sowyetan, gellek kesan koçî Îsraîlê kiriye û komeke mezin a koçberên Rûs derketiye holê. Her wiha di demên cûrbicûb de ji ber sedemên cuda gellek malbatan ji Etiyopyayê, Macarîstanê, Polonyayê, Îranê û Romanyayê koçî Îsraîlê kiriye, û vê rewşê Îsraîl bi tevahî xistiye nav kategoriya zimanê mozaîk. Bi van hemû tevgerên koçê re û bi bandora meylên gîştî yên dinyayê re li welêt jî salên 1990î pê de bi polîtîkayên liberal cûreyekî pîrr-kulturparêziyê hatiye pejirandin, û qonaxa ku ev ziman di dibistanan de wek zimanê perwerdehiyê, dersa zimên û dersa hîlbijêrî bêna fêrkirin dest pê kiriye. Bi ser de jî ber bandora têkiliyên bi cîhana Rojava re û bi taybetî bi Emrîka re li welêt Îngilîzî, ji her wextî bêhtir berbiçav bûye.

Perwerdehiya Pîrr-zimanî

Di ber guherînên li jorê hatî behskirin re sala 1993yan li Îsraîlê, navendeke plansaziya zimên hatiye damezrandin, û bi pêdiviya pêşvebirina polîtîkayên perwerdehiyê yên hevgerî ku di dibistanan de li ser perwerdehiya zimên mijarên demografîk û polîtîk dihesibîne, Agahînameya Wezaretê Perwerdehiyê hatiye belavkirin. Ev agahîname, li ser fêrbûn û parastina zimanên li welêt tîn axaftin û hîndekeya zimanên duwem û biyanî hûr bûye. Wek encama van polîtîkayên nû Erebi, Îngilîzî û Îbranîkî bûne zimanên bingehîn ên di perwerdehiyê de tîn bikaranîn.

Di dibistanên Ereban de yên li Îsraîlê Erebi zimanê bingehîn ê perwerdehiyê ye, lê belê Îbranîkî wek zimanê duwem, Îngilîzî jî wek zimanê sêyem tê fêrkirin. Di dibistanên Cihûyan de jî zimanê perwerdehiyê Îbranîkî ye, lê xwendekar hîn di temenekî biçûk de dest bi fêrbûna Îngilîzî dikin û gellekî giringî bo hîndekeya Îngilîzî tê dayîn. Her wiha bi qasî ji %50ê xwendekarên Cihû sê salan pê de dersên Erebi jî werdigrin. Ji bilî van zimanan zimanên Frensî, Rûsî û Yîdîşî jî di dibistanan de tîn fêrkirin.

Mirov dikare bibêje ku ji aliyê bernameya hîndekariyê û materyalên dersê ve bi saya beşên pêwendîdar ên di gellek zanîngehan de heyî, pergaleke rûniştî heye. Çi bernameya hîndekariyê çî jî materyalên dersê bi giştî di ber guherînên li ser politikayên perwerdehiyê re dibe ku bilez bîr guhertin. Ji bo zimanên Erebi, Frensî û Rûsî bi xwespartina zanyarî û ezmûneyên xwecihî materyalên cûrbicûr tîr amadekirin û di perwerdehiyê de tîr bikaranîn. Her wiha mirov dikare bibêje ku perwerdehiya bi piştgiyariya kompîterê jî di dibistanan de bilez bi pêş ve diçe.

Ji bo nirxandina zanyariyên akademîk ên xwendekaran û derbasbûna hîndekariya bilind jî ezmûnên bi navê Bagrut tîr kirin. Di van ezmûnan de behreya giştî, jêhatîbûna di matematîkê de û besatiya Îngilîzî ya xwendekaran tîr pîvan. Lê belê ev ezmûn ne tekane pîvan in. Zanîngeh dikarin ezmûnên xwe bi xwe bi pêş bixin û gava xwendekaran qebûl dikin dikarin li gorî ezmûnên xwe tevbigerin. Her wiha besatiya zimanê Erebi û Îbraniîki ya xwendekaran jî dîsa bi ezmûnên ku bi van zimana tîr kirin, tîr pîvan.

Ji aliyê mamoste-gîhandinê ve jî du rêyên cuda hene. Berendamên mamostetiyê yêr ku wê di dibistanên seretayî de bixebitin, perwerdehiya xwe bi awayekî bingeîn di dibistanên mamoste-gîhandinê de werdigrin, mamosteyên lîseyê jî diçin zankoyên perwerdehiyê yêr zanîngehan û xwe amade dikin. Her wiha jî bo Erebi bo Cihûyan bê fêrkirin bernameyên gîhandina mamosteyên Erebi tîr saz kirin. Ji aliyekî din ve li vî welatî pêdiviyeye cidî ya bi mamosteyên Îngilîzî tîr xuyakirin. Li welêt jî ber statuya xwedî prestîj a Îngilîzî, gîhandina mamosteyên Îngilîzî û hawirdekirina (daxil kirina) mamosteyên Îngilîzî jî welatên cuda, tîr xwe berbelav e. Bi heman awayî jî bo zimanên wek Rûsî û Frensî jî beşên mamoste-gîhandinê hene û jî van beşan pîr zêde berendamên mamostetiyê derdikevin.

Helwestên Mamosteyan li Hemberî Zimanan

Li gorî lêkolînên ligel mamosteyan hatine kirin, mamosteyên Erebi difikirin ku jî bo bikarin li Îsrailê bijîn mecbûr in bi Îbraniîki bizanin. Lê belê mamosteyên Cihû, bêhtir li ser hewcedariya zanîna Îngilîzî radiwestin. Li aliyekî mamosteyên Erebi piştgiyariya bikaranîna zimanê Erebi wek zimanê fermî û perwerdehiya duzimanî dikin, li aliyê din mamosteyên Cihû bêhtir piştgiyariya perwerdehiya bi Îbraniîki dikin.

Dîsa jî mamosteyên Erebi li gorî mamosteyên Cihû bêhtir giringiyê didin parastina zimanê dê û bavên û handana zimanê xwecihî yêr zarokan. Lê hemû mamoste di wê yekê de li hev dikin ku politikayên zimên hewce ye giringiyê bide gellek hunerweriyên derbarê perwerdehî û kulturê de. Herwiha bidebaxistina zimanekî bi parastina zimanê zikmakî (ger ev ziman zimanekî li derveyî Îbraniîki be) pêkan e. Mamosteyên Erebi piştgiyariya bihêzbûna zimanê zikmakî û berêtirbûna perwerdehiya bi zimanê zikmakî dikin beriya bidebaxistina zimanên din. Gava mirov danberheviyê bike ligel mamosteyên Cihû, meseleya zimên jî bo mamosteyên Erebi di heman demê de ligel meseleya nasnameyê yek e û pênasaya zimanan bi hebûn û raguhestina nasnameya kulturî re hevta ye.

Ji aliyekî din ve, çî mamosteyên Cihû çî jî mamosteyên Erebi balê dikşînin ser giringiya parastina zimanên koçberan.

¹ Lambert, R.D. (1995) *Language Policy: An Overview*. International Symposium on Language Policy, 20 December, Bar-Ilan University, Israel.

² Ev herêm, ew cih in ku bêhtir komên ku endamê çîna navîn a bilind in û dahateke wan a diyar a ciwokî û aborî hene, lê dijîn.



Zimanên Sámî û li Welatên Skandînav û Perwerdehiya bi Zimanên Sámî

Sámî, civateke xwecih e ku di nav sínorên her çar welatên Norwêç, Swêd, Finland û Rûsyayê de dimîne. Li gorî texmînan serjimêra Sámîyan bi giştî li dor 100.000 ye. Ji nav van bi qasî 60.000 li Norwêçê, bi qasî 20.000an li Swêdê, 9.000 jê li Finlandê û nêzikê 2.000an jî di nav sínorên Rûsyayê de dijîn. Herêmen ku Sámî bi xilbeyî lê dijîn rexên bakur ên van welatan e. Sámî, bi zimanên cûrbicûr ên ji heman malbatê diaxivin û bi kultura taybet bi xwe jî gelên cîran cihê dibin. Ger li rewşa aniha ya her sê welatên Skandînavyayê bê nihêrîn, ji deh zimanên Sámî bi pêncan perwerdehî tê kirin û zimanên Sámî di hindêk dibistanan de wek dersa zimên tên fêrkirin. Kildîn Sámî jî ku yek ji zimanên Sámî ye li Rûsyayê tenê heta radeyeke diyar tê fêrkirin.

Bi kurtî ger em behsa serpêhatiya zimanî ya civatên Sámî bikin; Sámî ji nivê sedsala 19. heta nivê sedsala 20. tûşî politikayên asimilasyonê yên bi zanebûn û carna jî ku tundiyeke cidî di xwe de dihewîne, bûne. Gellek mirovan bi sedsalan kultura Sámî û zimanên wan biçûk xistiye, wek kevnare/hovane nirxandiye û bir li wê yekê kiriyê ku wê xwe li ber jiyana modern ranagire û di encamê de ji holê rabe. Digel nêzîktêdayînên bi vî rengî, kultur û zimanên Sámî li ser piyan mane. Lê belê vê demê jî aliyekî ve ku guherîna kultur û zimên tê jiyîn, ji aliyekî din ve jî têkoşîna vejandin û parastina zimên berdewam dike. Dibistan di vê qonaxê de, di nav têkoşîna ku derbarê fêrbûna zimanên Sámî jî aliyê nîfşên nû ve tê dayîn de rolekî mezin dilîzin.

Ev zêdeyî 60 salan e civaka Sámîyan û kultura wan tûşî guherînên mezin bûne. Ev guherîn endazeyên ferasetî, materyalî û civakî radipêçin. Guherînan di heman demê de girîngiya li zimanan hatî kirin jî zêde kiriyê. Îro êdî civaka Sámîyan sekna xwe ya politikî bihêz kiriyê. Ev jî di serî de bi kêrî parastin û bihêzkirina zimanên Sámî, kultura wan û şewaza jiyana wan a kelepore hatiyê û hiştiye ku ev bînan raguestin bo nîfşên nû. Ji ber ku erdên Sámîyan ji aliyê dewletên cuda ve hatiyê parvekirin, mirov nikare bibêje ku komên Sámîyan tev stratejiyêke hevgerî û hevpar didin ber xwe. Lê belê Sámîyên ku pabendê pergalên politikî, rêveberî û kulturî yên çar dewletên ji hev cuda ne, da ku di stratejiyên xwe de serkeftî bin dîsa jî car caran hevkarî û hevgerîneke hevpar bi rêk dixin û mafên xwe diparêzin.

Ji modêlên perwerdehiyê yên li herêma Sámî tên sepandin di dibistanên seretayî, dibistanên navîn, perwerdehiya pişeyî, kolêjan û zanîngehan de armanc ew bûye ku ziman, dîrok û zanyariya kulturî ya Sámîyan bo nîfşên nû bê raguestin. Her çend salên dirêj pê de li herêma Sámî, bi zimanên Sámî perwerdehî nehatiye kirin jî, bi taybetî piştî sala 1970î li Norwêç, Swêd û Finlandê di perwerdehiya Sámîyan de zimanên wan ên zikmakî hatine

bikaranîn. Lê belê salên beriya wê jî gellek dubendî pêk hatine. Em polîtîkayên zimên ên van her sê welatên Skandînav derbarê Sâmiyan de berfirehtir binin zimên.

Swêd

Li Swêdê perwerdehiya Sâmi bi sê modêlên cuda tê meşandin. Ji van a pêşîn, şeş dibistanên taybet ên biçûk ên Sâmi ne ku li bakurê welêt cih digrin. Ya duwem ew modêl e ku zimanê zikmakî wek ders tê fêrkirin. Dawiyê jî modêla sêyem heye ku di vê de zimanê Sâmi, di dibistanên ne-Sâmi de tê fêrkirin.

Dibistanên taybet ên Sâmi li herêmên Sâmiyên ku gakoviyên cemsêrî (bakurî) xwedî dikin, cih digrin û li ber hemû zarokên Sâmi vekirî ne. Li gorî qanûna perwerdehiyê, zarokên Sâmi perwerdehiya xwe ya mecbûrî dikarin ji wan dibistanên Sâmi wergirin ku beşek in ji dibistanên dewletê. Dibistanên Sâmi ji aliyê dewletê ve tîn meşandin û bi riya Rêveberiya Dibistanê ya Sâmi ku ji aliyê Dîwana Sâmi ya Swêdê ve hatî wezîfedarkirin, tîn birêvebirin. Di dibistanên Sâmi de zimanê perwerdehiyê bi zimanên Sâmi û bi Swêdî tê kirin. Li gorî bernameya hîndekariyê jî, her xwendekarê ku biçe dibistanên Sâmi wê derbarê mîrateya kulturî ya Sâmi de bibe xwedî zanyarî, û wê qabiliyetên axaftin, xwendin û nivîsandinê bi zimanê Sâmi bi pêş ve bixe. Rêveberiya dibistana Sâmi, sebarek bi dibistanên Sâmi di heman demê de ji perwerdehiya pêş-dibistanê ya koma 6 salî jî berpirs e. Bi ser de, îro êdî baxçeyên zarokan ên ser bi dibistanên Sâmi hene û bi zimanê Sâmi listik tîn listin û çalakî tîn kirin. Dibistanên Sâmi yê li Swêdê ger tenê bi ji % 5-10ê zarokên Sâmi nemînin û bî zêdekirin, ev dibistan di dahatûyê de bo Sâmiyan dibe ku rolekî giring bilîzin.

Di modêla ku hîndekariya zimanê zikmakî tê kirin de jî, her çend mijarên bernameyên hîndekariyê bi zimanekî din bî kirin jî zimanên Sâmi wek dîrsa mecbûrî ya zimên tîn fêrkirin. Heta sala 1976an zimanên Sâmi yê ku di vê modêla perwerdehiyê de dihatin bikaranîn, wek “zimanên malê” dihatin binavkirin. Lê belê heja ye mirov bibêje ku di vê modêlê de hindek tengasî tîn pêşberî mirov. Lewra li gorî qanûnan, ger xwendekarek bixwaze bi zimanê Sâmi dîrsa zimanê zikmakî wergire divê besatiyeke wî ya diyar hebe di vî zimanî de. Yanî zarokên Sâmi yê ku nikarin bi zimanê xwe biaxivin, mafê wan nîn e vê dîrsê wergirin. Dîsa li gorî qanûnan, şaredarî ger mamosteyekî ku perwerdehiya wî ya bi zimanê Sâmi guncav be tayîn bike, ev ders dikare bê dayîn. Ya rastî ev şert û merc nahêlin ku zêdetir xwendekar ji vê modêlê sîdê wergirin.

Ji perwerdehiya Sâmi ya cûreyê sêyem re jî “perwerdehiya Sâmi ya yekkirî” tê gotin. Sedema vê ew e ku zimanên Sâmi û kultura wê, wek beşek ji wê perwerdehiya mecbûrî ya li welatê wek bîngêh lê ye tê dîtin ku ne li ser bîngêhê Sâmi ye. Ev modêl, bi awayekî bîngêhîn li Swêdê tê sepandin, li dewletên din ên ku civatên Sâmi lê ne nayê sepandin. Ji bo gellek xwendekaran perwerdehiya Sâmi ya yekkirî, tê wê wateyê ku dibistana seretayî bi zimanekî din î li derveyî zimanê xwe yê zikmakî bixwînin û ji polê 7. heta bi polê 9. perwerdehiya xwe di dibistanên Sâmi de berdewam bikin. Lê belê dîsa jî pareke mezin ji perwerdehiya van xwendekaran bi Swêdî tê dayîn. Her wiha ji ber ku rêveberiya dibistanên Sâmi piştgiriya aborî bo hemû xwendekaran terxan nake, her xwendekarek bixwaze beşdarî perwerdehiya Sâmi ya yekkirî bibe jî dibe ku nekare ji vê sîdê wergire.



Ji van sê cûre bernameyên perwerdehiyê yên Sámî yên li Swêdê di rastiye de bi tenê bi qasî ji % 20 xwendekarî dikare sûdê wergire. Mixabin sazkarîyên derbarê perwerdehiya Sámî de ji salên 1970î û vir ve ewqasî nehatine guhertin û li ser rêjeyên xwendekaran guherîneke giring pêk nehatiye. Lê belê dîsa jî daxwaziya bo perwerdehiya bi zimanê Sámî tê kirin ji salên 1990î pê de li xwe zêde kiriye. Di vê zêdebûnê de perwerdehiya vejandina zimên a ku bo wan xwendekarên bi Swêdî diaxivin lê bi etnikî Sámî ne, tê dayîn, bûye hander.

Norwêç

Wê ne şaş be em bibêjin ku Norwêç li ser mijara perwerdehiya bi zimanê Sámî xwedî demokratiktirîn nêzîktêdayîne ye. Lê belê heta ku rewş hatiye vir, di dewrên têra xwe zordest re hatiye derbasbûn. Norwêça ku di nîveka sedsala 19. de politikayêke perwerdehiyê ku armanca wê asimilasyon bû dabû ber xwe, ev helwesta xwe bi qasî 100 salî berdewam kiriye. Axaftina bi zimanê Sámî û stran-gotina bi zimanê Sámî bi balan qedexe maye û zarokên Sámî li dibistanan tûşî hermonîkirinên cûrbicûr bûne. Lê belê çalakîyên şermezariyê ku bi taybetî salên 1970yî û 1980yî hatin lidarxistin li dijî wê santrala elektrîkê ku dihat xwestin li ser Çemê Altaya li herêma Sámî bê avakirin, ji bo Sámîyan bûye destpêka qonaxeke nû. Lewra bi saya çalakîyên hatî lidarxistin, Sámîyan hem kariye bibin asteng li ber avakirina bendava li ser çem, hem jî bi tevgerên din ên dijber ên li Norwêçê re hevgiirtin bi rêk xistine û karîne destkeftiyên giring bi dest bixin derbarê perwerdehiya bi zimanê Sámî de. Muxalefeta Sámî ya salên 1950yî destpêkirî, bi van rûdanan re bêhtir bihêz bûye û bi saya lihevhatinên ku heta îro jî berdewam in destkeftiyên cûrbicûr ên politik, kulturî û rêveberî bi dest xistine. Ji van ên herî giring ew bûne ku saziyên wek Zanîngeha Sámî, Enstîtuya Sámî ya Lêkolînê, Dîwanên Sámî û Civata Sámî ya Parlamenteran hatine damezrandin û van saziyan ji bo berjewendiyên Sámîyan xebat kirine.

Bi qonaxa “dibistana berfirehî” re ku ji salên 1960î destpêkirî, gellek reform hatine kirin ku zimanên Sámî, kultura wê û perwerdehiya bi zimanê Sámî radîpêçin. Ji ber vê sedemê, statuya perwerdehiyê û ya politik a zimanê Sámî bilez bi pêş ve çûye. Berevajî qanûnên Swêd û Finlandê, Norwêçê, bi qanûnên perwerdehiyê ji bo zimanê Sámî mafên eşkere û safî xistiye gerê. Perwerdehiya Sámî li her dera ku dibistanên Norwêçî lê ne hatiye pêkanîn. Dawiyê jî bi qanûneke ku sala 1998an hatî derxistin, pergala dibistana berfirehî ya 10 salane hatiye pejirandin, temenê despêkirina dibistanê jî daketiye 6 saliya xwendekaran. (Li Swêd û Finlandê pergala dibistana berfirehî neh salane ye û perwerdehiya dibistanê 7 salî dest pê dike). Di rewşa îro de, qanûnên li Norwêçê mafê wergirtina perwerdehiya mecbûrî bi zimanê zikmakî dide hemû xwendekarên Sámî. Li gorî qanûnê, hemû xwendekarên ku li herêma Sámî diçin dibistana berfirehî (yên ne Sámî jî tê de), dikarin bi zimanê Sámî bixwînin û dersên xwe yên bernameya hîndekariyê bi zimanê Sámî fêr bibin.

Fînlend

Perwerdehiya Sámî ya li Fînlendê, li nav pergala perwerdehiya ku navendî ye hatiye daxilkirin. Ji salên 1970yî û vir ve ji bo ku di dibistanan de hîndekariya Sámî û perwerdehiya bi zimanê Sámî bikare bê kirin, rê û rêbazên cûrbicûr hatine ceribandin. Herî dawî sala 1998an derbarê perwerdehiyê de qanûnên nû ketine fe’aliyetê. Bi van qanûnan re, li tevahiya Fînlendê pergala perwerdehiya berfirehî ya 9 salane ku perwerdehiya Sámî jî saz dike, hatiye sepandin. Li gorî vê hatiye derpêşkirin ku di hemû dibistanan de di zimanê

perwerdehiyê û çalakiyên derveyî dersan de Fînî an jî Swêdî bê bikaranîn. Lê belê li herêma Sámî derfeta perwerdehiya bi zimanê Sámî û li hin herêmên niştecihwar de jî derfeta perwerdehiya bi Romenî an jî bi zimanê nîşanê tê pêşkêşkirin. Lê belê ji bo ku xwendekarek ji perwerdehiya ku li herêma Sámî tê meşandin sûtê wergire, divê Sámî be ji rexê nijadê ve. Her wiha di wan dibistanan de ku zimanê Sámî ne zimanê perwerdehiyê ye, wek darsa hîlbijêrî (zimanê biyanî yê duwem) di salên pêşî yê perwerdehiya mecbûrî de an jî li gor daxwazê di polên 7an û 8an de dikare bê wergirtin. Dibistan bixwe dikarin biryara wê yekê bidin ku kîjan ziman wê wek hîlbijêrî bê dayîn.

Di qanûnan de li ser zimanê Sámî, derbarê perwerdehiya li derveyî herêma Sámî de tu xal tune ne. Li herêma Sámî, perwerdehiya Sámî di nav plansaziya budçeya taybet de cih digre û dibistanên li herêmê piştgiriya perwerdehiya Sámî dikin. Her ku dibistanan girîngî da perwerdehiya Sámî, budçeya ku ji aliyê dewletê ve tê terxankirin, zêde dibe. Mixabin, li ser mijara perwerdehiya bi zimanê Sámî li Finlandê, hê jî hindêk kêşe hene. Li gorî Parlamentoya Sámî, ji %60ê serjimêra Sámîyan û ji % 70yê zarokên Sámî yên 10 salî piçûktir, li derveyî herêma Sámî dijîn. Ji lewma ev zarok, nikarin bi zimanê xwe yê zikmakî perwerdehiyê wergirin, li şûna vê zimanê xwe di bin banê zimanê koçber de bi riya dersên hefteyê tenê 2 saet û niv dikarin fêr bibin. Ji ber vê yekê, Finland, eynî wek Swêdê, di polîtîkayên xwe yên perwerdehiyê de gelên xwecih ên li derveyî herêma xwe dijîn, di statuya koçber de dipejirîne.

Wek encam; civatên Sámî, gava mirov wan bide ber gellek komên kêmine yên li Ewropayê, îro xwedî perwerdehiyê baştir û şert û mercên zimanî ne. Lê belê ev nayê wê ma'neyê ku fe'aliyetên perwerdehiyê yên bi zimanên Sámî bê serêşî û kêşe ne û her tişt li gor daxwaza dilê civatên Sámî dimeşe. Civatên Sámî, li hemberî dewletên ku erdên wan di bin kontrola xwe de girtine, têkoşînên desthilatê yên demdirêj meşandine, piştî salên dûvdirêj hindêk destkeftiyên girîng bi dest xistine. Bi saya vê, ber li windabûna bilez a zimanên Sámî û tunebûna kultura wê hatiye girtin. Lê belê dîsa jî Sámîyên ku li derveyî herêmên Sámî dijîn, bi taybetî li Finlandê û li Swêdê ne xwedî statuyê qanûnî ya cidî ne û destûr tê dayîn ku bi tenê ji mafên koçberiyê sûtê wergirin. Ji lewma, naskirina mafê perwerdehiyê bi zimanekî diyar gava bi herêmeke erdnîgarî hat sînardarkirin, ji bo wan mirovên ku ji heman civatê ne lê belê li derveyî herêma navborî dijîn, tengasî û kêşeyên cidî pêk tên. Ji ber vê yekê, nimûneyê Sámî bi awayekî eşkere nîşan dide ku di pêşveçûnên ber bi bikaranîna zimanê zikmakî di perwerdehiyê de, mafê navborî divê bi erdnîgariyê diyar neyê sînardarkirin, berevajî vê li her dera ku ev ziman tê axaftin hewce ye ku zemîneke guncav bê amadekirin da ku sût ji van mafan bê wergirtin.

Ulla Aikio-Puoskar

Têbînî: Ev nivîs, ji gotara bi navê "The Ethnic Revival, Language and Education of the Sámi, an Indigenous People, in Three Nordic Countries (Finland, Norway and Sweden)" bi kurtkirin hatiye wergirtin. Ji ber vê hevoê di nivîsê de hati bikaranîn ne wergêrên rasterast ên deqa orijînal in. Gotar, di kitêba bi navê Social Justice Through Multilingual Education de hatiye çapkirin ku bi editoriya Toue Skutnabb-Kangas, Robert Phillipson, Ajit K. Mohanty û Minati Panda hatî weşandin.



Pirr-zimanî û Perwerdehî li Welatên Paş-Sowyetî

Herêma ku di nav sînorên Yekîtiya Sowyetan a berê de dimîne, bûye xwedî erdnîgariyeke bêserî û binî û zimanên neymar. Ji ber vê rewşê jî hema her dewrê de li ser mijara polîtîka û plansaziya zimên nîqaşên cûrbicûr rû dane.

Ger mirov bi awayekî dîrokî lê binêre, mirov dibîne ku di serdema Rûsyaya Sowyet de polîtîkayên zimên ên têra xwe nelihev/hevne gir hatine meşandin. Di demên pêşî yên piştî şoreşa Bolşevîk de, azadî bo hemû komên zimanî –zimanekî wan î nivîskî yê standard hebe tunebe- hatiye dayîn ku karûbarên xwe yên taybet û yên gelemperî bi zimanên xwe bimeşînin, ji bo duristkirina elîfbayên zimanên nexwedî elîfba akademî hatine avakirin û piştgiriya pêşveçûna wan zimanan hatiye kirin. Armanca polîtîkayên bi vî rengî, çawa ku di kongre û konferansên şoreşê yên cûrbicûr de jî hatî destnîşankirin, avakirina civakeke bihevre ya sosyalîst û damezirandina dewleteke bihêz bûye. Lê belê rejîma Sowyetan pê de ev polîtîka bi heman awayî nehatine berdewamkirin, di demên cuda de, hinek kom bin zordestiyê de hatine girtin an jî wekû bi tenê nixke wan a folklorîk hebe hatine nişandan. Ji aliyekî din ve li herêmên berbiçav zimanên serdest ên derveyî Rûsî dihatin axaftin, li wê herêmê her tim xwedî otonomiyeke taybet bûn, lê belê zimanên kêmine yên prestîja wan kêmtir li vê herêmê ji otonomiyeke bi rengî nedikarin sûde wergirin û bi awayekî berbelav tûşî asimilasyonê dibûn. Mirov dikare rewşa Ozbekên li Tacikistanê û Abxazên li Gurcistanê bo vê yekê wek mînak nişan bide. Lê belê sala 1991ê bi jihevbelavbûna Sowyetan re li vê herêma pirr mezin ji aliyê zimanî ve guherînan giring pêk hatin. Welatên ku serxwebûna xwe îlan kirin serê pêşî hewl dan ku xwe ji bandora Rûsî xelas bikin, ji aliyekî ve jî hewl dan ku zimanên din ên kêmine yên di nav sînorên wan de mayî, winda bibin. Li gorî vê, hinek welatan elîfbaya Kirilî ku berê dihat bikaranîn terk kir û derbasî elîfbaya Latînî bûn, di dam û dezgehên dewletî de, di ewraqên fermî de û di saziyên perwerdehiyê de li şûna Rûsî zimanên xwe yên serdest bi kar anîn. Mirov dikare polîtîkayên ziman û perwerdehiyê yên van welatan li gorî cihgiritina wan a erdnîgarî li sê koman dabeş bike.

Ewropaya Rojhilat

Rûsyaya Spî (Belarûs), Estonya, Latviya, Lîtvanya, Moldova û Ûkrayna, li beşê Ewropaya Bloka Rûsyayê cih digrin. Van her şeş welatan di navbera salên 1988-1990î de zimanên xwe yên serdest wek zimane tekane yê dewletê îlan kir. Guherîna tenê ew bûye ku Belarûsê sala 1995an zimanê Rûsî bi awayekî fermî wek zimanê duwem pejirand. Ûkraynayê zimanê xwe wek tekane ziman pejirandiye û ziman, di karûbarên dewletî de, di saziyên siyasî de, di dibistanan û di hemû qadên jiyana gelemperî de hatiye berbelavkirin. Lê belê Ûkraynayê polîtîkayên xwe yên zimên bêyî ku bala xwe bide avasaziya demografîk, çekiriye. Bo nimûne;

Li bajarên wek Kîevê dibistanên ku bi zimanê Rûsî perwerdehiyê didin hatine girtin, zarokên malbatên ku zimanê wan î zikmakî Rûsî ye naçar hatine hiştin herin dibistanên ku bi zimanê Ûkraynayê perwerdehiyê didin. Li Moldovayê jî elîfbaya Latîni hatiye sepandin, Moldovî û Romenî ku zimanên serdest in, di hemû qadan de ji nû ve hatine bikaranîn. Bi vê yekê re di saziyên perwerdehiyê de ev ziman hatine bikaranîn, her wiha ji bo zimanên din ên kêmine jî wek Ûkraynayî, Gagavûzî û Bulxarî di perwerdehiyê de bînan bikaranîn, sazkarîyên qanûnî yê pêwîst hatine kirin. Li Estonyayê hîndekariya navîn ji % 82yan bi zimanê Estonyayê tê dayîn; lê belê zimanên wek Rûsî, Finî û Swêdî jî wek zimanên kêmine xwedî statuya fermî ne. Zimanê Estonyayê di dibistanên kêmineyan de wek zimanê mecbûrî tê dayîn. Xwendina bilind bi zimanê Estonyayê tê kirin. Li Latviyayê jî armanca reforma sala 2004an ew bûye ku di hîndekariya navîn de zimanê Latviyayê bê bikaranîn û di qonaxa derbasbûnê de jî perwerdehiya zarokên ku zimanê wan î zikmakî Rûsî ye bibe duzimanî (mifredat ji % 60 bi zimanê Latviyayê, ji % 40 jî bi Rûsî). Li Lîtvanyayê jî hîndekariya navîn bi zimanê Lîtvanyayê û bi zimanên Lehî, Rûsî û Belarûsî ku zimanên kêmine ne, tê kirin. Li vir jî, jimara dibistanên ku perwerdehiya bi Rûsî didin her diçe kêmtir dibe. Xwendina bilind bi zimanê Lîtvanyayê tê kirin, lê hinek enstîtû wekî din bi Îngilîzî jî perwerdehiyê didin.

Welatên Transkafkasyayê

Transkafkasya, ji welatên Ermenistan, Azerbaycan û Gurcistanê pêk tê. Ev ew welat in ku di serdema rejîma Sowyetan de tenê zimanên wan ên neteweyî wek fermî hatiye qebûl kirin. Piştî jihevbelavbûna Blokê, ev ziman wek zimanê dewletê yê welatên xwe hatine pejirandin. Lê belê, zimanê Abxazî yê li Gurcistanê jî li herêma xweser a Abxazyayê wek zimanê fermî hatiye qebûl kirin. Azerbaycan, ji elîfbaya Kirilî derbasî elîfbaya Latîni bûye û bikaranîna Rûsî li welêt di hemû qadan de têra xwe kêmtir bûye. Li Ermenistanê jî her çend zimanê dewletê Ermenkî ye jî, statuya fermî bo zimanên din hatiye dayîn. Bi ser de, Ermenistan di nav van her sê welatan de baştirîn welat e ku kariye mafên zimanên kêmine biparêze. Sedema vê ew guherîna tundrew in di polîtîkayên zimên de ku sala 1999an pêk hatî. Armanca perwerdehiya zimên a îro ya Ermenistanê, gihandina nîfşên sê-zimanî ye. Di nav van zimanan de di serî de Rûsî, Îngilîzî, Frensî û Elmanî tên. Lê belê sala 2001ê Peymana Parastina Zimanên Kêmine ya Ewropayê hatiye îmzekirin û bi vê yekê zimanên Yewnanî, Kurdî, Rûsî û Êzîdî bûne xwedî statuyeye qanûnî û bo gelên ku bi van zimanan diaxivin, mafê perwerdehiyê bi zimanên xwe yê zikmakî, mafê wergêriyê li dadgehê û mafê bikaranîna zimanên xwe yê zikmakî bi serbestî di çalakîyên dîni, aborî û civakî de hatiye dayîn, herwiha tevdir hatine girtin da ku ev derbasî pratîkê bînan kirin.

Asta besatiyê di zimanên serdest û zimanên etnîk ên li Azerbaycanê de têra xwe bilind e. Rûsî, zimanê duwem an jî yê biyanî ye ku li welêt herî zêde tê axaftin. Hîndekariya navîn bi Azerîkî, Rûsî û ji bo Gurciyên etnîk jî bi zimanê Gurcî tê dayîn. Her wiha bo komên kêmine yê ku bi jimar kêmtir in, her çend sînordar be jî mafê perwerdehiya bi zimanê xwe yê zikmakî hatiye dayîn. Xwendina bilind, bi Azerîkî, Rûsî, Îngilîzî û Tirkî tê kirin.

Li Gurcistanê hîndekariya navîn bi zimanên Gurcî û Abxazî, her wiha wek zimanên kêmine bi zimanên Rûsî, Azerîkî û Ermenkî tê dayîn. Zimanê Gurcî di dibistanên kêmineyan de wek mecbûrî tê fêr kirin, û Rûsî jî zimanê mecbûrî yê duwem e. Ji sala 1991ê û pê ve jimara



dibistanên Rûsî têra xwe kêr bûye. Wek nişaneyeke vê yekê; malperên înternetê yên fermî yên serokatîyên dewletê li Azerbaycan û Ermenistanê, li gel zimanê dewletê bi Îngilîzî û Rûsî bi awayê sê-zimanî tîr şixulandin, lê belê malpera înternetê ya fermî ya serokatîya dewletê li Gurcistanê tenê bi zimanê Gurcî û Îngilîzî erka xwe tîne çih.

Welatên Asyaya Navîn

Di navbera salên 1989-1990î de Qazaxistan, Qirxizistan, Tacikistan, Turkmenistan û Ozbekistanê zimanên xwe yên serdest wek zimanê dewletê îlan kirine û Rûsî wek zimanê ragihandina nav-komî pejirandine. Sala 1990î Ozbekistan, Rûsî wek zimanê kêrîne ragihandîye, li Qazaxistan û Qirxizistanê jî Rûsî bûye zimanê fermî. Heta sala 2007an Ozbekistan û Turkmenistan ji elîfbaya Kirilî derbasî elîfbaya Latînî bûne, Tacikistanê jî bikaranîna elîfbaya Kirilî berdewam kiriye.

Li Qazaxistanê zimanê Qazaxî di hemû dibistanên Rûsî û kêrîneyan de bûye zimanê mecbûrî, di hemû dibistanên ku perwerdehiya bi Qazaxî didin de jî Rûsî bûye zimanê duwem ê mecbûrî. Xwendina bilind bi Qazaxî û Rûsî tê kirin. Li Qirxizistanê jî perwerdehî bi polîtîkayên ku pîrr-zimaniyê dipejirînin, tê meşandin. Armanca ew bûye ku di zimanê Qirxizî, Rûsî, zimanekî biyanî û zimanên kêrîne de besatiya zimên bê geşepêdan. Di hîndekariya navîn de bi zimanên Qirxizî, Rûsî, Ozbekî û Tacikî perwerdehî tê dayîn, lê belê di dibistanên ku perwerdehiyê bi Qirxizî nadin de, Qirxizî wek dersa zimên a mecbûrî tê xwendin. Di dibistanên ku bi Rûsî perwerdehiyê nadin de jî Rûsî wek dersa zimên a mecbûrî tê xwendin. Di xwendina bilind de jî zimanên Qirxizî, Rûsî, Ozbekî, Îngilîzî, Tirkî û Erebi dikarin bî bikaranîn. Li Ozbekistanê hîndekariya navîn bi awayekî berbelav bi Ozbekî tê dayîn, lê belê nêzîkê 300.000 xwendekarên ji komên zimanî yên cuda di dibistanên ku bi Rûsî perwerdehiyê didin de dixwînin. Di wan dibistanên ku bi Ozbekî perwerdehiyê didin de jî Rûsî wek zimanê duwem heftiyê du saetan ji polê yekem heta bi polê yazdehem tê dayîn. Xwendina bilind bi Ozbekî, Rûsî, Qereqelpaxî û Îngilîzî tê dayîn, lê her wiha di zanîngehê de di hin warên zanistê de perwerdehiya bi Qazaxî, Tacikî û Turkmenî tê dayîn. Li Tacikistanê hîndekariya navîn bi zimanê Tacikî û bi çar zimanên kêrîne; bi Ozbekî, Qirxizî, Turkmenî û Rûsî tê dayîn. Ji sala 2004an pê de Rûsî wek zimanê duwem ji polê duwem heta bi polê yazdehem hatiye mecbûrîkirin. Di xwendina bilind de jî perwerdehî bi zimanên Tacikî, Ozbekî û Rûsî tê dayîn. Li Turkmenistanê jî hîndekariya navîn û xwendina bilind bi Turkmenî tê dayîn, lê Rûsî û Ozbekî ku zimanên din ên serjimêra wan bilind e li welêt, gellekî tîr ixmalkirin. Ji lewma di demên dawî de ji van her du komên kêrîne, koçberiyên ber bi derve yên cidî pêk hatine.